

DAXUYANIYA GLADBECKER

Em çawa dixwazin di pêşerojê da bi hev ra bijîn

Em radigihînin ku me nîrxên hevpar hene ku em li gorî wan bi hev ra dijîn.

Bingeha vê yekê Qanûna me ya Bingehîn û rêzikên bingehîn dêmokratîka azad a Komara Federal a Almanyayê ye. Ji hemî kesên ku li Gladbeck'ê dijîn tê xwestin ku van nîrxan bi awayekî çalak di jiyane da cih bînin û bixin pratîkê!

Em bajarekî azad û bi tolerans in ku têda bi rêzdarî û dostane bi hevra danûstandinê dîkin. Ji wan yek jî ew e ku me bêyî berçavgirtina esliyet, temen, zayend, dîn, rûvek, rewşa aborî, nêrîna zayendî an astengdarbûna bedenî rêzê li hevdu digirin. Em dewsa ku hevdu biqewirînin, bi rastbînî û pêbawerî li hevdu nêzik dibin û meraqa hevdu dîkin.

Em bi awayekî çalak di pêkhatina pêkvejiyana xwe da hevkarîyê dîkin. Gişt divê li gorî meyl û meraq û şîyanên xwe di vî karî da beşdariyê bikin. Di vî warî da em pêşwaziyê li hemî kesên ku vê dawiyê tên ba me, dîkin.

Em bajarek in ku têda girêdayî bi hev in. Em li gorî kevneşopiyên xwe alîkariya hevdu dîkin. Lawazî divê werin nîşandan û gişt kesên ku di rewşa awarte da ne, piştevaniya ku bo wan hewce ye, werdigirin.

Em xalên erênî li bajarê xwe û xizmetên ku her kesek di jiyana xwe da jibo xwe û kesên din pêk tîne, dibînin û rêzê li wan digirin.

Rêzgirtin ne tenê jibo mirovan, belkî her wiha jibo mekan, kolan, park, dibistan, erdên lîstinê û sporê ye. Em bi baldarî wan bi kar tînin. Ewna mekanên me û malên me ne. Di vî warî da parastina jîngeha xwe sermiyanekê pirr giranbiha ye ku em bi hev ra wê diparêzin.

Jibo me girîng e ku di cihên gelemperî û taybet da mafên hevdu berçav bigirin. Mafê her kesî ye ku di aştî û aramiyê û bêyî ku were acizkirin, bijî. Azadiya kesane di cihekî da bi dawî dibe ku azadiya kesên din destpê bibe.

Em di aştî û aramiyê da bi hev ra dijîn. Ciyawazî û nakokî dê hertim hebin, lê emê van nakokiyan bi awayî aştîyane û bi gotinê û bêyî tundiyê çareser bikin. Pîrsgirêk bêyî ziyangihandina li hevdu, di gotûbêja rasterast da an di medyayên civakî da tên hilêxistin.

Em li dijî cihêkarî, nijadperestî û Papiyolîsma rastgir (Rechtspopulismus) in. Me ew wêrektî heye ku bi awayekî şaristanî li hemberî wan rawestin.

Em gişt di vê yekê da berpirs in ku nîrxan bi hev ra di jiyane da cih bînin!

Em hertim ji vê yekê pêşwaziyê dîkin ku heke bi nêrîna me durust be, derbarê nîrxên navbirî di vê daxuyaniyê da careke din bi hev ra biaxivin.

Ji ber ku: Babetên nû hertim têda derfetek heye ku em li Gladbeck'ê bi wêrektî û xweşbîniyê jê sûd û behreyê werdigirin.